


Hun dê wisa me li Beckum bibînin:



Alleestraße 59
59269 Beckum

Tu dê bi otubusê heta rawestgeha „Rathaus“ herî. Di rêya Alleestraße re here heta tu bigihîjî avaniya hijmar 59 (Avaniya xizmetgûzariyên derûnî-civakî yên dezgeha tendurustiyê ya herêma Warendorf). Ku tu gehiştî wê derê, ji kerema xwe re were oda hijmar 0.05 li qata jêr.

Civanê te ji bo şewirdariyê di nameya vexwendinê de hatiye nivîsîn.

Heger pirsên te hebin telefûna me bike!

Emê bi dilxweşî rê bidin ber te!

Hijmara telefûna me ev e: 0 25 81 - 53 45 05

Daner:

Von-Geismar-Straße 12

59229 Ahlen

www.ki.kreis-waf.de

Peywendî:

eva-maria.sendt@kreis-warendorf.de

Tel.: 0 25 81 - 53 45 05



bi zimanên din
in other languages
en d'autres langues
en otros idiomas
diger dillerde
في لغات مختلفة

<http://www.waf.de/erstberatung>

Piştgîriya navenda hemgunciyînê ya herêmî tê kirin
ji aliyê:

Ministerium für
Schule und Bildung
des Landes Nordrhein-Westfalen



Ministerium für Kinder, Familie,
Flüchtlinge und Integration
des Landes Nordrhein-Westfalen



Weşan: Çileyê pêşîn 2017

www.kreis-warendorf.de

Für die Zukunft gesattelt.

 **Kommunales
Integrationszentrum
Kreis Warendorf**

Şewirdariya destpêkê

Zarok û xortên ku nû hatina

Almaniya û malbatên wan

School Szkola École
Scuola Escola
Sola Chuo Skola
Dibistan Shkolë

 **KREIS
WARENDORF**


Dayik û bav û Berpîrsên perwerdeyê yê hêja!

Hun bi xêr hatin herêma Warendorf.


Hemî zarokên ku temenê wan di navbera 6 û 18 salan de ne divê li Almaniya herin dibistanê. Her tiştên ku divê tu hay jê hebî, di vir de nivîsandiye.

Wisa destpêdike


1. Navenda hemguncînê ya herêma nameyeke vexwendinê ji bo te dişîne. Di wê nameyê de civanek ji te re tê destnîşankirin.



2. Ji kerema xwe re bi zaroka xwe re here vî civanî. Hemî pasportên xwe û (heger mumkun be) belge-nameya qeydiya xwe bi xwe re bibe. Û heger bawernameyên zaroka te yê dibistanê hebin, ji kerema xwe re wan jî bi xwe re bibe.



3. Heger derfet hebe, ji kerema xwe re kesekî bi xwe re bîne, ku hindekî bi zimanê amanî zanibe. Karmendên navenda hemguncînê ya herêma wê ji bo te li wergreki jî bigere.




Di navenda hemguncînê ya herêma de

4. Karmendên navendê dixwazin bizanibin, kengî zaroka te hatiye dinîyayê, bi çi zimanan diaxive û çend salan çûye dibistanê. Û wê ji te biprsin, ka ma gelo zaroka te dizane bi zimanê almanî biaxive yan na.

Li herêma Warendorf hindek sinfên dibistanê hene, ku zarok karibin tê de zû fêrî zimanê almanî bibin. Wê hemî agahî û zaniyariyên derbarê sinfê ziman û dibistanê di civanê şewirdariyê de ji te re bêjin.



5. Hêdî navenda hemguncînê ya herêma wê agahdariyên derbarê zaroka te ji dibistanê re bişîne.



Piştî şewirdariyê

6. Di vê navberê de wê ji te re civanekî li ba dezgeha tendurustiyê çêkin û ji te re bişînin. Ev civan gelekî giring e, ji ber ku divê her zarokek berî ku derbasî dibistanê bibe, were kontrolkirin. Navenda hemguncînê ya herêma wê alîkariya te ji bo sazkirina civanekî li ba vê dezgehê bike.



7. Navenda hemguncînê ya herêma ya herêma Warendorf wê ji te re bêje, ka zaroka te wê here kşjan dibistanê. Û hêdî zaroka te dikare here dibistanê.

Em serkeftinê ji we re dixwazin!



Hizir: Bajarê Köln, Wêne: Herêma Warendorf, Nivîs: Hindek ji wan ji KI Kreis Lippe hatin wergirtin. Zor sipas ji bo piştgîriya dostane!